

## Te got û min got nebû tu cot

Memê Alan

Di bîjin bi gotgota tu kar bi serî nabin , bi gulekê buhar çênabin , bi destekî çepik lênadin û nejî bi mirovekî dêlan digerin

Yanê bi rêvebirin û bi serîkirina her karekî li paş gotabêjê , kirdekirin gereke

Hîn divê cîhana tijî guherînên zor lezok de , kirdekirina tevane û giştî jî ne bese

Çi kar be , ta ku , bi dawî were û mirov tê de bi serkeve , pêşve here û bi guherînan re bimeşe , hin merc û erk divên .

1-Gotbêj û şirovekirina li ser wî karî û zelalkirina wê gereke , ta ku ev encama diyar dibin :

- Armanc ji wî karî , yanê mirov çî ji wê karî dixwaze .

- Beramberkirina kar û zîrarê wî karî  
- Danîna bernamakê ji bo serxistina wî karî .

- Binavkirina kes an komîteyên wê kar û lebatê .

2-Hejmarên endamên wê li gor mezinbûna wê karî bin .

3-Pisporkirina wê karî û belavkirina beşên wê li ser endaman , ta ku , durvekî dezgehî û li saz destîne .

Çimkî mirovek bi tena xwe nikare karekî ji xwe mezintir yan jî ne karê xwe bi serxîne .

Ji xwe berê herweha mirovek nikare pir karan jî bi hev re bike , ger kir jî yan nikkare wek tê xwestin bi serkeve , yan jî wê di nivê rê de bimîne û biweste.

4-Qîretiya endamên çî karî be û berpirsiyariya wan bi hev re li pêş wê merceke giring e .

5-Şopandina karên wan endaman ji aliyê lêvegerê û berpirsiyariya wan

li pêş wê lêvegerê .

Yanê mirov têdighê ku , tu kar tewşankî , bê sazîkirin û bi gotgota ne baş bi serdikeve û nejî pêşve diçe . Herweha doza me Kurd li Sûriyê jî , karekî zor mezin jêre divê , serkeftina wê jî , hebûna mercên me li pêş anêne zimên gerekî .

Mexabin ji dêvla peydakirina wan mercan bervaçî wê xebat bi rê ve diçe wek :

1-Perçebûn û nelihevkirina tevgera Kurd li Sûriyê .

- Pîrbûna Partiyên wê , ne kêmtirî sêzde Partiyên .

- Herweha pîrbûna tar û çemberên wê ( Enî – Encûmana giştî ya Hevbend , Komîta bilind ya Hevbendî , Tensîq ) .

- Tunebûna nêrîneke zelal li ser çarşekirina doza Kurd li Sûriyê di navbera aliyên tevgerê de .

- Zêdebûna Partiyên ku , tu rastiyê bêjî navên partiyên lê nabin û masiyan di golên herimî de digirin , bi hin aliyên derve ve girêdayî , û hinên dî ku , zêdegaviyan dikin , her diçe nexwşiya tevgerê pirtir dibe û nahêle berhevhatin çêbibe .

2- Di hundir her Partiyekê de , kar û barên wê bi cefa û qîretiya hin hevalan dimeşin .

Û yên dî jî , ji ber kar xwe didin alî û xwedî gotgot û loman e . Vêca defret çêdibe ku , kesên ne li yaqî , li pir ciyan cî bigirin . 3-Hemî karên têne kirin jî durrî karên dezgehên û pisporî ne . Yanê tewşankî dimeşin wek Erebbêjin : Harit kul mîn îda ilo .

4-Rola tevgera rewşenbîrî ya Kurd jî mirov dikare bibêje

**D.R ( 11 )**